

## Materyal

- Parçeyeke mezin qumaşê ji pembûyê çêkirî ku be kelandinê xira nabe, bi pîvanên 17 x 34 cm (ji bo mêran 17 x 36 cm, ji bo zarokan 12 x 24 cm)  
Divê qumaşê bi kêrî bêhbvedanê bê! Vê yekê berê kontrol bikin. Du parçeyên qumaşê bixin ser hev û tund bixin ser dev û pozên xwe. Heger hûn karbin bi hêsanî bêhn bidin û bistînin, hingê qumaşê ji bo parastina devê minasib e.
- Du şerîten qumaş 90 cm dirêj û 2 cm berfireh
- Du şerîten qumaş 17 cm dirêj û 2 cm berfireh
- Têleke zirav û 15 cm dirêj (Tela karên destî, Tela paqijkirina lûleyan, Têla metal yê broşûran)



1. Qumaşê du qatan li ser hev raxin û li ser tenîştên qatkirî çargoşeyeke mezin bi pîvanên 17 cm x 17 cm xêz bikin.

Di heman demê de her çar parçeyên dirêjtir yê bidestketî li gorî mezinahiya pêwîst xêz bikin û bibrin.



2. Qumaşê çargoşeyî yê du caran qatkirî ûtî bikin.



3. Di qumaşê qatkirî de sê qatên biqasî hev dabeşkirî (kûrahiya qatê 1.3 cm) çê bikin û ûtî bikin



heya ku bilinidiya qatê digehe qasî 8,5-9 cm.



4. Du şerîtên qumaşê ku berfirehiya wan 2 cm e, heya nivî ûtî bikin.



5. Beşê jor ji qumaşê li ser parçeya qumaşê 17 cmî bicîh bikin (bihêzkirina teniştan).

Niha têla 15 cm dirêj bixin navbera wan de û hemû qatên qumaşê pêkve sabît bikin.




6. Çar şerîtên qumaşê ku berfirehiya wan 2 cm e, heya nîvî ûtî bikin (xêzên çeprast).



Hingê divê hemû bi temamî wusa xuya bike.



7. Qatên ûtîkirî yê qumaşê bixin ser hev û deynên NAVBERA herdu aliyên şerîtên qumaşê de (şerîtên ser) û sabît bikin.



8. Di gava dawiyê de herdu aliyên şerîtên dirêj tîn dirûn bi awayekî ku qumaşê sabitkirî ji herdu aliyên ve bête dirûtin.



Em hêvî dikin ku  
hûn kefxweşiyê ji  
dirûnê bibînin û  
bimînin tendirûst!

Em dixwazin we agahdar bikin ku Klinîka Leverkusen ji bi bandorbûn,  
çêkirin an jî bikaranîna rastîn ya maska demkî ya dev û poz ku we  
bixwe dirûtiye, ne berpirsiyar e.